

Arîşeyên me yên der barê ferheng, zarava û têgihan de

Zana Farqînî

Ez ê hewl bidim der barê van mijarê hanê de ku min ew ji xwe re kirine navê gotara xwe, hezir û ramanê xwe daxuyînim. Ez ê serê pêşîn ji mijara ferhengê dest pê bikim.

Ji bo ku zimanek bibe zimanê nivîskî, hewcedarî bi sê stûnan heye ku jî ew alfabe, rêziman û ferheng in. Her wiha ji bo standardiya zimanê nivîskî jî pêwîstî bi rêbera vekîtê angî bi rêbera rastnivîsê heye. Li aliyê din, ji ber parçebûnê, rewşeke me ya alozdar jî heye ku alfabe yek ji wan e. Ji ber ku ziman hêmana sereke ya netewebûnê ye, hewce ye ku netewe xwedî alfabe, rêziman, ferheng û her wiha xwedî rêbereke vekîtê ya standard be da ku di her warî de yekîtiyeke zimanî pêk were.

Çendî mijara alfabayê derî mijara min be jî, min divê ez balê bikişînim ser cudahiya alfabeyan ku gelê me (sedem çî dibe bila bibe) wan bi kar tîne û ev yek jî dibe sedema alozî û berbihevnehatina gelê kurd û ev a hanê nahêle ku kesên ji beşên cuda yên welêt jî berhemên hev ên nivîskî fehm bike û ji wan sîd bigire. Ev astengeke mezin e û divê kurd di zûtirîn demê de xwe ji vê rewşa nelibar rizgar bike.

Ferheng

Piştî van çend gotinên der barê alfabayê de, îcar ez hez dikim vegerim ser arîşeyên me yên li ser ferhengan. Eger ez bibêjim em kurd hîna ne xwedî ferhenga xwe ne, divê ku ev gotin wek gotineke pirole (mubalexe) û mezin neyê dîtin. Bi rastî jî hîna ferhengeke me ya tekûz a berfireh ku ji her kesî re bibe referans û kurdî bi kurdî be, nîn e.

Mebesta min a ji ferhenga kurdî bi kurdî jî, ne ew e ku hemû peyvên zaravayên (lehçeyên) kurdî bigire nava xwe û wan bihewîne. Qet nebe niha hewcedariya me bi ferhengên tekûz û berfireh ên zaravayan heye. Hin ferheng ne tê de (Wek a Gîwî Mukriyanî) jixwe hemû yan ferhengên du zimanî ne yan jî yên zaravayekî kurdî ne. Ferhengên du zimanî an bi kurdî û zimanekî serdest in an jî bi zimanekî serdest û bi kurdî ne.

Gelş û arîşeyeke din a van ferhengan heye, ji bilî ku berteng in, ew tam bi awayekî zanistî ya ferhengsaziyê nehatine amadekirin. Rast e, bi fedekarî û bi giyanekî amatorî hatine amadekirin, ez bi awayekî giştî dibêjim, lê ji hêman û azînen akademîk bêpar in. Wek nimûne, di gelean de cureyên peyv, bi gotina nemir Celadet Bedirxan birên qîsetê nîn in. Danerên ferhengan ev cureyên peyv (navdêr, rengdêr, hoker, baneşan, gihanek, lêker û hwd.) nedane nîşandan. Hin zaravayên kurdî xwedî zayend in, mîna kurmancî û kirmancî (zazakî), îcar di ferhengên van zaravayan de nêrîtî û mêtîya peyv nehatine aşkerakirin, ku ev yek nebe dê bikarhêner ji ku bizanibe bê ka bêje nêr e yan mê ye.

Kêşeyeke din jî ev e ku ji ber zimanê kurdî zimanekî tewangbar e, ne tenê navdêr her wiha lêker jî di dema kêşanê de ditewin û hem dengdar (konsenant) hem jî dengdêr (vokal) di rayeka dema niha de diguherin. Loma divê ku her du rayekên lêkeran jî bê nîşan dan da ku bikarhênerên ferhengan bikaribim bi hêsanî lêkera ku binasin û bi awayekî rast bi kar bînin.

Digel van, di warê termên ziman de jî eflasyonek heye û her wiha termînolojî û kurtebêja van terman jî hev nagire û standardek jî di vî warî de tune ye. Ji bo transîttîfê em rastî peyvên gerguhêz, derbasî û têperê tê. Ji bo îlaweyên ku tên pêş, paş û dikevin

navbera peyvane, em bêjeyên wekî pêrkî, navkî, parkî; paşgir, navgir û navgir; paşkok/paşpirtik/paşbend/paşdanî; pêşbend/pêşdan/pêşdanî û hwd. dibînin. Ji bo hokerê (ango zerfê) peyva rengpîşe, ji bo cînavkê (zamir) pronav, ji bo bireserê (ango objeyê) berkar û berkirdê tînan bikaranîn. Ev lîste bi hêsanî dikare bê dirêjkirin, lê ji bo ronîkirina mijar û mebestê ez dibêjim qey ev çend nimûne bes in û têr dikin.

Li aliyê din em ne xwedî ferhengên cur bi cur in jî. Kêmasiyên me gelek in. Wekî ferhengên pîşeyî (meslekî), ferhenga etîmolojiyê, ferhengên li gorî asta bikarhêneran. Loma pêwîstî bi ferhengên cuda cuda yê li gorî ast û pîşeyan heye û em pir dereng jî mane.

Bi rastî ferhengên heyî, yê li ber dest, qet ne nebe ez dişêm ji bo yê zaravayên kurmançî bibêjim, li gorî çapana cîhanê tam ne ferhengên standard in. Mirov nikare bibêje ku ew li gorî zimanê nivîskî hatine amadekirin. Gelo ew ferhengên berhevkarîyê ne, ferhengên veshîkirinê ne (ku tirk ji wan re dibêjin “derleme sozlugu” û “tarama sozlugu”) tam ne diyar in. Li aliyê din wateya peyvê ya rast û ya mecazî ji hev nehatine cudakirin. Peyv bi awayekî berfireh nehatine dayîn û ravekirin. Belkî jî sedem ew e ku em ne xwedî rêbera vekîte ne, loma bêhneke zêde ya herêmî ji hin ferhengan tê û daner devoka herêma xwe ji bo xwe bingeh û hîm dîtiye.

Ji bo ku em ji van bifilitin û bibin xwedî ferhengên tekûz û tam, loma dam û dezgehên meyên çandî, nemaze dameziraweyên me yê ku li ser zimanê kurdî dixebitin, divê ku ji bo amadekirina her cure ferhengên kurdî xwe bi rêxistin bikin, kadroyên xwe xurt bikin, aboriya xwe, derfetên xwe yê darayî zêde bikin û bi rê û rêbazên zanistî û akademîk û bi kadroyên profesyonel, bi kesên ehlê kar lez bidin kar û barên ji bo amadekirina ferhengan û xwe ji arîşeyên heyî rizgar û reha bikin.

Zarava

Hebûna zaravayan (dîyalektan) jî rewşeke me ya din e ku divê xebatên baş ên zanistî li ser wan bînin kirin û qet nebe der barê hejmara wan de em bibin xwedî ramaneke hevpar. Der barê hejmara zaravayan de û li ser navên wan, nakokiyê mezî heye. Di her xebat û berhemeke li ser zimanê kurdî de, mirov rastî agahî û hejmarên cuda tê. Pirs ev e, gelo çend zaravayên kurdî hene û navên wan çî ne. Bi min re qeneatek çêbûye ku yan çar an jî pênc in. Ev ramana min jî xwe dispêre xebatên pêbawer û kesên ku di war û biwara zimanê kurdî de otorîte tînan hesibandin. Meseleya ku çar an jî pênc in jî, ji ber rewşa kirmançî û goranî diqewime, ku yê din kurmançî, kurmançiya jêrê û loranî ne. Yê ku wan yek dibînin hene û yê ku wan cihê dibînin hene. Îcar ez naxwazim bi awayekî misoger û vebir bibêjim ku yan çar an jî pênc zaravayên kurdî hene. Tenê dibêjim ku hejmara zaravayên kurdî hewceyî zelaliyê ye.

Her wiha gelş û gelemşeyê jî der barê navê van zaravayan de heye. Li rojhilat ji kurmançî re şikakî, li başûr behdînî, li bakur kirdasî tê gotin. Ji kirmançî re kirdkî, zazakî, dimilî/dimbilkî, ji kurmançiya jê re soranî/babanî, ji goranî re hewramî û hwd. tînan gotin. Divê ku navê van jî bê zelal û ronîkirin û em bigihîjin hin biryarên hevpar.

Li hêla din, mijareke din jî ew e ku divê bi awayekî giştî siyaseta me ya der barê ziman û zaravayan de kifş û diyar be. Helwesta me divê çî be? Bi navê zimanê yekgirtî, zimanê fermî divê em zaravayekê ji xwe re hilbijêrin an jî derî polîtîkaya neteweweyî ku her tiştê xwe li ser feraseteke tekparêziyê (monîzmê) ava dike tev bigerin an jî li gorî ruhê felsefeya sedsala 21'ê û ferasetaya dewlet û neteweya demokratîk tev bigerin ku

cihêrengiyê diparêze û mafê jiyana wan dabîn dike. Bi ya min divê em pirrengiyê, pirçandiyê, pirzaravatiyê, bi gotina kin î kurt, divê em hebûna cudatiyan biparêzin, wan bihêvişînin û vê yekê ji xwe re zengînî bihesibînin. Çi tiştên ku serdestên me li me kirine û me ji destê wan kişandibe, divê em wan nekin û xwe ji wan dûr bigirin. Her zarava wek hev e, yek ji yekê re divê ne serdest be. Cudahiyên me divê wek dewlemendiya me bîn pejirandin.

Pêwîst e em der barê zaravayan de xwedî helwest û feraseteke çêkirinê bin. Em ne cudatiyên zaravayên xwe lê divê em wekhevîtiyên wan, eynîtiyên wan, muşterektiyan wan derxin pêş. Ji bo nimûne, di van pazdeh bîst salên dawî de gelek peyvên kurmançiya jêrê ketin nav kurmançî, ku ev yek jî bi zanebûn hate kirin. Hewcedariya hemû zaravayên kurdî bi peyv, têgih û termên nû hene, divê em ji hev bistînin, ango danûstandinek di navbera zaravayan de hebe. Ev yek, li aliyê din, dîsan divê ku em peyv û bêjeyên nêzî hev tercîh bikin. Wek mînak di kurmançî, kirmanckî û kurmançiya jêrê de peyva “kar” muşterek e. Eger em di zimanê nivîskî de, di çapemenî û perwerdeyê de peyvên wiha bi kar bînin, em zaravayan nêzîktirê hev û din dikin. Na ku em di kurmançî de “şol/şixul” di şûna peyva navborî de tercîh bikin, em wê gavê xwe ji zaravayên din hinekî din jî dûr dixin. Ku helwesta me ev be, ev rewş dê bike ku zarava, qet nebe zimanê nivîskî yên van zaravayan ber bi hev werin û nêzîkbûn û têgihîştina ji hev zêdtir dibe.

Bi kurtasî; dûrkirina ji hev a zaravayan jî di destê me de ye, anîna wan a ber bi hev jî.

Têgih

Ji kurmançiya jêrê gelek peyv, têgih û term ketine kurmançî ku hinek ji wan bi şaşî di nav kurmançî de cihê xwe girtiye. Wekî peyva rêveber. Li başûr ev di şûna midura erebî de, lê li bakur li şûna kargêr û îdarekar de tê bikaranîn. Li bakur ji belediyeyê re em peyva şaredarî bi kar tînin, li başûr şarevanî û bajarvanî tê bikaranîn. Li bakur zarava lehçe ye, lê li başûr term û têgih e. Ev jî arîşeyek e mezin e ku divê çare jê re bê dîtî û hewce ye termînolojiya me jî hev bigire.

Ji bilî van têgih û peyvên, ku em dikarin hejmara wan zêde bike, hin peyvên nû hene ku tam cihê xwe nagirin. Mehne û wateya ku li peyvê hatiye barkirin na, lê peyva çêkirî mehneya xwe ya ji ber hêmanên ku bi wan hatiye dariştin, li ser me ferz dike. Nimûne; peyva nasname, gelo “identity” ya îngilîzî ye ya jî “identity card” a îngilîzî ye? Bi ya min ew bergînda belgeya pênasbûnê ye, kart û belgeya nivîskî ye. Ji ber ku bi “name” gava peyvek bê çêkirin, wateya belgeya nivîskî dide. Mînakeke din, gotina katjimêr/demjimêr e ku li şûna seata erebî hatiye afirandin. Lê ev ancax dikare şûna navê alavê/alet bigire, an jî bergînda peyva kronometreyê be. Ango katjimêr/demjimêr şûna bîst û çar parçeyên demê ku şêst deqîqe ye, nagire. Ji bo vê mijarê ez mînakeke din jî dixwazim bidim, ku mirov dişê bi sedan peyvên wiha derpêş bike. Peyva jîngeh, li şûna “environment” û “habitat”ê tam nagire, wateya cihê ku mirov lê dijî dide.

Em bala xwe didinê ku hin peyvên nû yên dariştî ne li gora rêbazên rêzikên gramere hatine çêkirin û duristkirin. Bi taybetî yên ku bi parkîten/paşgirên /-van/ û /-geh/ê hatine çêkirin. Wekî rojnamevan, siyasetvan, helbestvan, serşogeh, komalgeh... Li şûna rojnamevan rojnameger, li şûna siyasetvan siyasetmedar û siyasetkar, li şûna helbestvan helbestkar, li şûna serşogeh serşok, li cihê komalgeh komal heye. Ev rewş ji gêjahiyê pê ve tiştêkî çênake. Em qertafên/îlaweyên ku bi wan peyv tînin çêkirin baş nas nakin loma ev alozî diqewime. Berî her tiştî pêwîst e ku haya meriv ji erk û fonksiyona pêrkî/pêşgir, parkî/paşgir, navkî/navgirên zimanê kurdî hebe û li gora erk û fonksiyona wan peyvên

nû hilberîne. Ji bo nimûne, bi parkîta /-van/ê çend peyv ne tê de, bi piranî kirdenavên ku nobedarî digire nav xwe tên çêkirin. Bi /-geh/ê navê cihên servekirî, lê dorgirtî tên çêkirin.

Dîsa hin rayekên lêkeran, ku wek paşgir tên bikaranîn jî, dibin sedemên arîşeyan. Wekî mînak zimannas û zimanzan, dîroknas û dîrokzan. Gelo kîjan rast e, an divê mirov kîjanê tercîh bike?!

Mijareke din jî ew e ku peyvên biyanî, nemaze yên ku di ser zimanê serdestên me de, ji zimanê wekî fransî û îngilîzî ketine kurdî, li bakur û başûr ji hev cihê tên nivîsandin û bilêvkirin. Mîna peyvên oksîjen/oksîcîn, konfrans/konfirens, kongre/kongire, komputer/kompiyoter, komedî/komêdî, komunîst/komonîst, demokrat/dîmokrat û hwd. Bilêvkirin û nivîsana wan a ji hev cihê jî, bi xwe arîşe û kêşeyeke din e ku divê jê re çareseriyek bê dîtin.

Encam: Heta ji destê min hat, min xwest ku ez bi awayekî kurt, lê bi daxwaza ku ez bikaribim fikir û ramanê xwe bi zelalî aşkera bikim, der barê van her sê mijaran de ramanên xwe vebêjim. Ji bo standardiya zimanê nivîskî û anîna ber bi hev a zaravayan ev her sê mijar jî pir girîng in û divê dam û dezgehên hemû beşên welêt bi hev re bi xebitin. Qet nebe di nav koordînasyonekê de bin û di van waran de gavên berbiçav bînin avêtin ku warê ziman ji bo neteweya kurd zor girîng û tiştekî jêneger e.

Divê di zûtirîn demê de, ji bo hemû zaravayên kurdî dezgeh bînin avakirin, ji bo standardiya navxweyî ya zaravayan xebat bînin kirin û meşandin. Bi ya min, bi qasî çêkirina ferheng û xebatên berbihevanîna zaravayan, amadekirina rêbera rastnivîsê jî girîng e û divê naveroka sazî û dameziraweyên zimanî ji aliyê kadroyan ve bînin xurtkirin û ev kar û bar jî, ji aliyê zimanzan, pispor û akademîsyenan ve bînin kirin. Heta niha kesên dilxwaz û dilsoz ev kar û xebat kirine. Mala wan carek na hezar car ava be, lê ji niha bi şûn de kar û erk divê li ser milê kesên ehlê kar be û divê sazî jî bi erk û peywira xwe rabin û derfetên xwe zêdetir bikin û butçeyên xwe ji bo kirina van kar û xebatan terxan bikin.